

PEYWEND Peywend Akademî

Gerîndeyê Giştî

M. Xalid SADÎNÎ

Navê Pirtûkê

Xanînasî

Edîtor

Abdulhadi TÎMURTAŞ

M. Zahir ERTEKÎN

Ayhan TEK

Cure

Peywend Akademî - 6

Isbn

978-625-7568-26-5

Nimroya Weşanê

136/4

Berg û Mîzanpaj

Dr. Îbrahîm Mîrza

Çap

Wan, 2021 - Çapa 1.

Çapxane

Bizim Büro Basım Evi Yayın ve Dağıtım
Hizmetleri Sanayi ve Tic.Ltd.Şti.

Sertifika

42488

Weşanxane

Peywend

Nedim Odabaşı İş Merkezi

Kat: 1 No: 33 İpekyolu VAN

GSM: 0532 354 44 65

   @peywendkitab

 www.peywend.com

 www.kitabakurdi.com

Ji bilî jêgirtinên kurt ên ji bo danasînê, bêyî destûra nivîskî ya
Weşanên Peywendê bi tu awayî nikare bê zêdekirin û kopîkirin.

© Weşanên Peywend, 2021

XANÎ: SEYDA Û KOÇER

(Dîbaceya Dekonstruksîyona *Mem û Zînê*)

Prof. Dr. M. Nesim DORU^{1*}

I.

Ya rastî îro xebatên li ser Xanî li gorî dema borî zêde bûne. Berê, hinek xebatên sîvîl hebin jî îro xebat piranî li ser akademyayê û rêbazên zanistî didome. Gelo di çarçoveya zanistî an jî mentiqî de Xanî li kuderê radiwestê? Xanî wek kesayetêkî pirrengî bi çi awayî dibe mijarekî zanistî? Mentiq û zanist gelo ji bona têgihîştina fikr û ramanên Xanî têrê dike an na? Xanî gelo zanyar e, aqilmend e, filolog e an jî hunermend e? Kî ye an jî çi ye? Îro qada “kurdolojî”yê bi çi awayî Xanî dike heyber? Kurdolojî wek qadek zanistî bi çi potansiyelên xwe derbarê Xanî de dibe sedemên tegihîştinê? Ev pirsên ha, tev jî, dide nîşan ku pêwîst e Xanî wek kesayetêkî pirsgirêk bête nirxandin.

II.

Xanî berî her tiştî kesekî xwedî fikr e. Yanî “hizirvan” e. Ez dikarim bêjim hizirvanê yekemê Kurda ye. Sedem ne ku tenê têkiliya wî bi hizrê re bi awayekî xurt heye lê sedem ew e ku bi avayekî cuda ku di halê “sînorî” û “kinarî” de bi hizrê re têkildar e. Hizr çiyê? Bîranîn e. Lê di heman weqtî de di xwe de jibîrkinê jî dihewîne. Nexwe hem jibîrkin hem jî bîranîn bi hev re di hizrê de kar dikin. Hizirvan jî hem tiştê jibîr dike hem jî tîne bîra xwe. Herdu lêker jî, bi bêtir “bîr”ê ve girêdayîye. Nexwe heman tişt dibe du (pir) tişt. Di hizrê de ev herdu tişt ne dijî hev in bileks bi hev re dimeşin. Nexwe wek kesê “jibîr dike” û “bîr tîne” yanî hizirvan bi vî buyîna xwe kî ye? Bi dîtina min, ew kesê ku di vî sînorî de radiwestê yanî di sînorê dijeyatîyê de rasteqîniya “hem ew/hem ev” ê de buyîna xwe pêk tîne, ew hizirvan e. Belku em bêjin kî nîn e wê baştir bê derkandin. Bo nimûne Xanî, ne aqilmend û ne feylesof e. Lewra aqilmend her tiştî bîr tîne û ji her tiştî re, ji her pirsê re bersivêk wî/ê heye. Feylesof jî bi vî rengî ye. Di nav sîstemekê de hebûnê

1 * Prof. Dr. Zanîngeha Ankara Sosyal Bilimler, Fakulteya Zanîstên Beşerî û Civakî.

dinirxîne. Ji her tiştî re pênasayek, danasînek, dabeşiyek û taksonomiyek wî/ê heye. Di nav sîstema xwe de her tişt tişteke temsîl dike û ew jî di nav vê temsîlê de “şad û bextewar” e. Hêza wî/ê feylesof û aqilmend, ya rastî “gotin” e an jî “suxen” e yan jî “logos” e. Gotina wî/ê, hêz û otorîteya wî/ê bi xwe ye. Dema mesele dibe gotin/suxen/logos, wê demê “xwedîtî” derdikeve rojevê. Aqilmend an jî feylesof ji aliyê temsîlê ve hatine bihêzkerin. Ev temsîl bi hêza “bav”î tê zanîn. Bav, xwediyê gotinê ye û logos jî wî bi temsîlê didomîne.

Di mîtolojiyên kevn yên wek Misrê û Yewnanê de nivîs bi bîranîn û jibîrkerinê ve girêdayî ye. Bu nimûne dema Theuth, Mîrê heremekê ya Misrê, ku mûcîdê nivîsê ye, vê îcada xwe pêşkeşî Mîre Mîranê Misrê Thamus dike, dibêje min dermanê (*pharmakon*) jibîrkerinê û ne-zanînê peyda kir an jî dît. Mîrê Mîrân jê re dibêje ev derman ne dermanê jibîrkerinê ye lê belê dermanê bîranînê ye. Bi vê îcadê êdî kes ji bo zanînê zehmetiyan nade xwe. Dema jibîr bikin wê li nivîsê binêrin û bibîr bînin. Di gotina Mîrê Mîran de hêzek derdikeve holê. Ev hêza serhilatdariyê ye ku gotin ji bo hukmî bes e. Gotin/logos sîstem û temsîla mîrektyê û îqtidarê ye. Nexwe gotin karê mîran û aqilmend û zanyaran e. Di vê çarçoveyê de **“Di îqlîmê suxen xaqan im”** a Melayê Cizîrî bînin bîra xwe ku Melê jî aqilmend û feylesofekî an jî zanyarekî Kurdan e ku Xanî ê wî **“bêcih û bêwar”** bike, emê li ser vê meselê rawestin.

Lê belê hizirvan ne di nav çî sîstem û temsîla de rola xwe *dilehîze*. Bi vî rengî *bê-bav* e. Ne kurê/logos çî kesê ye. Tevgera hizirvan ne li ser gotinê ye lê belê li ser *nivîsê* ye. Nivîs hêza hizirvan e û derfeta derketina ji navenda logosê dide wî/ê. Heqîqet di nivîsê de nayê derdestkirin. Her daîm di nav revêkê de ye û tê texîrkerin. Dema heqîqet tê dîtîn di cih de ji dest wunda dibe û lipeybûnek din destpê dike. Nexwe nivîs her daîm di nav hewildanekî bê sînôr û bê dawî de her daîm di halê lipeybûnê de tê tomarkirin. Ev sînôr, “sînora bê sînôr” e. Nivîs di navbera jibîrkerin û bîranînê de wekî ku di hejîkê de diçe û tê. Ev jî, ji xwe tebîetê hizirvan e.

Nexwe em dikarin bêjin ku eger ji bo Kurdan hizirvanê ewil Xanî be nexwe nivîskarê ewil jî ew e. Ev cudahiya wî ye ku, derketina ji hêza gotinê û temsîlê, wî dike nivîskarê yekem. Di vê çarçoveyê de ji bo ku ez meseleyê şênbertir bikim, Xanî wek hizirvan bi bêjeya “Seyda” ve girêdayîye. Seyda jî ne bi gotinê lê belê bi nivîsê buyîna xwe encam dide. Bi vê wateya xwe, wek kesayetek têgehî û rasteqînî ya Kurdî de Seyda ne bi melayan û ne bi şêxan ve girêdayîye. Seyda, wek nivîskar, *bê-bav* e û hêza wî li ser çûn û hatina ziman û hebûnê ye. Lewra Seyda di zimên de xwedî qabiliyet e û her daîm bi bêje û têgehî, bi wate û heqîqetê re dilehîze. Ev têgihîştina lîstîkê di *Mem û Zînê* de jî dibe bîngeha çîrokê ku emê behsa vê bikin. Nexwe Xanî hizirvan e yanî nivîskar e yanî Seyda ye.

Seydayê Xanî di hewildana xwe ya destxistina heqîqetê de ticar li ser rê û rê-bazên ilmî û zanistî ne rawestiye. Li gorî Xanî di destxistina heqîqetê de helbest, ji zanist û analîzê pirtir rol digire. Hetta berhemên wî yên “ilmî”, *Nubihar* û *Eqî-*

dename, jî dîsa menzûm ango di şêweya helbestê de hatine nivîsîn. Em helbestê dikarin dîsa bi revekê binirxînin. Reva ji gramatik, morfoloji, semantîk û wateyê ye. Newxe helbest ji ber ku derbasbûna ji ziman, gramer û wateyê ye em dikarin bêjin ev hal halê nesekinandinê û tevgeriya daîmî ye. Ji ber vê, helbestvan ji ber ku her tim di nav revekê de ye heman weqî de *koçer* e jî. Helbest guhdarî û çavnêriya hebûnê ye û hêvîkirina lutf û diyariyekê ye. Pêwîst e hebûn, xwe ji wî/e re derbêxe, eşkere bike û were meydanê. Lewra wek Heidegger jî gotî helbestvan şivanîtiya hebûnê dike. Eger ziman mala hebûnê ye nexwe helbestvan jî çavnêrê vê malê ye. Heman tişt ji bo hizirvan jî derbasdar e. Newxe wek kurte, Xanî hizirvan û helbestvanê hebûnê ye yanî seyda û *koçer* e. An jî *seydayekî koçer* e.

Dem a mesele dibe helbest an jî *koçerî* wê demê listik jî dibe mijara me. Lewra helbest bi serê xwe listikek e. Ne tenê listika bi bêjeyan re lê belê listika bi heqîqetê re jî di helbestê de derdikeve holê. Dîsa halê sînorê de destnexistina heqîqetê derbasdar e û *koçer* ji bo ku di bin alema temsîlê de neyê qodkirin, remzkirin û şifrekirin her daîm di halê tevgerê de ye. Ev tevger wî dibe li bal guhdarî, çavnêrî û şivanîtiya heqîqetê. Di halê hişyariyê de û di sînorê heqîqetê de (ne di hewşa heqîqetê de ne jî ji derveyî hewşê de) radiwestê, lê li wir cih nagire. Ev celebekî listikê ye.

III.

Hizirvan û helbestvan, Seydayê *koçer*, Xanî, bi fikr û hizrek “nû” derdikeve pêşî me. *Nûbar*, *nûbihar*, *newbar*, *newresîd*, *nû-erûs*, *bikr*, *efîf* û *dûşîze/hymen* hwd. Ev têgehên ha jî, berê me didin saziya ziman û nivîsê. Ziman ne tiştêkî metafîzîk ango paşirûşt e lê belê li ser cudahiyan tê avakirin. Ev cudahî di zimên de her daîm dilehîzin. Bi vî awayî ziman, xwe bi awayê dîrokî de çêdike, ava dike û dihilberîne. Di vê çarçoveyê de têgehên Xanî yên li jor hatî zikirkirin hem hizrek nû dide me hem jî imkanên ferq û cudahiye tîne ber çavan. Lewra Xanî berhema xwe ne bi zêr û zîvî lê belê bi sifrê dide pênasekirin. **“Kurmancî ye, sirf e, bê guman e/Zêr nîne bibên sipîdîman e- Sifrê me ê sor e, aşîkar e/Zîv nîne bibên ku kême ‘eyar e.”** Ev pênasekirina bi *bikr* û *dûşîze* û *efîfê*, têgehên Derrîda ku li hember sîstema gotin û temsîlê avakirî yên wekî “cîgir”, “nivîs”, “pêvek”, “dews/şop”, “nîşan”, “perdeya keçîktiyê” û “kînar”ê tîne bîra me. Weke din Xanî vê hewildana xwe ya nû û cuda re bêjeya “pîlewer”ê jî zikir dike. Pîlewer çerçî ye û ew tiştê ku ne bi gewherê tê qîmetkirine. Gewher weke tê zanîn mahiyet û puxte ye. Ev jî alema temsîlê pênase dike. Lê belê ne di rê yên eslî û sereke de lê belê li pey rêyên talî ku nayên qodkirin û temsîlîkirin diçe. **“Ez pîlewer im ne gewherî me/Xudruste me ez ne perwerî me”**. Xanî ji vê hewildana xwe re dibêje **“xilafê mutad”** an jî **“bid’et”**. Ez jî ji vê re, bi sîdvergirtina ji Deleuze, dibêjim “bêcihkirin û bêwarkirina Xanî”. Xanî çi an jî kê bêcih û bêwar dike? Bê goman di serî de Melayê Cizîrî.

IV.

Her kesê di warê hizr û helbesta Kurdî de xwedî helwest be pêwîst e ku bi Melayê Cizîrî re bikeve nav muhasebeyekê. Mela di hizr û helbesta xwe de li ser rêbaza “ne ew/ne ev” ê diçe û hebûnê, buyînê bêcih û bêwar dike. Li gorî wî her tişt di heqîqetek gelemperî û komkirî de tê nixandî. Ev yekitiyek teqez û bala ye. Pirrengî di bin “rengê bê reng” de, ferq di bin eyniyetê de tê xetimandin û fetisandin. Her tişt di heman nasnameyê de tê berhevkirin û çî cudahî û ferq di navbera wan de namîne. **“Em têk hewiyat in yeqîn ism in ji mesder muşteq in/ Mewhûm û laşey’ mutleq in ‘eks in di nêv ayîne da.** Li gorî Mela hebûn û buyîn bi xwe ji ber ku derbasdar in çî heqîqetên serbixwe temsîl nakin. Eynîti û dijberî, wekhevî û analoji li gorî wî ne nasnameyên rasteqîn in û di bin hebûna mutleq de tîcîm hev û wunda dibin. **“Çî zeman û çî mekan û çî cihat û çî hudûd/ Çî meqadîr û tefasîl û hisab in çî ‘eded - Çî munafat û luzûm in çî qiyas û çî misal/ Ev çî tewlîd û çî terkîb e çî rûh in çî cesed”.** Têgihîştina “ne ew/ne ev”ê, jêqerîna dunya û uqbayê, ewwel û axirî û mu’min û kafirî ye jî. Mebest hebûna mutleq e û ji bilî vê çî rasteqînên din, ne li vir û ne li wir tune ne. Lewra vir û wir bi serê xwe ne mewcûd in. **“Wellah ji herdu ‘aleman min husnê canan e xered/ Lew min ji husna dilberan her sun’ê Rehman e xered”.** Heqîqeta gelampêr û giştî her tiştî di xwe de dihevine û dibe berhevkarê her tiştî. **“Huwe’l-Ewwel huwe’l-Axir huwe’z-Zahir huwe’l-Batin Huwe’l-Me’bûdu we’l-Meşhûdu fî kullî’l-huwiyatî”.** **“Her yek e dê yek bimînit, ewwel û axir yek e”.**

Seydayê koçer, vê têgihîştina Melayê Cizîrî hildiweşîne. Li hemberî bêcihkirin û bêwarkirina Cizîrî ji bo hebûnê, Xanî bi terzekê cûda, bi “bicihkirin û biwarkirina hebûnê”, Cizîrî bêcih û bêwar dike. Bi nîşankirina nuqteyek girîng, ku bi dîtina min ev nîşankirin felsefeya Xanî xulase dike, berê me dide rasteqîniya vê cihanê. Cizîrî ji ber xetera cisimbûnê, hebûn wekî tiştê herî bala û negihêjî nixandî bû. Xanî welê xuya ye ku vê mitala Cizîrî aniyê ber çav û berê wî daye rasteqînek din. **“Nînin te teheyyuz û temekun/ Emma we di wan dikey tewettun”.** “Tewettun”, yanî cihbûn û warbûn e. Hebûn bi vî şiklî di nav mekan û şûnê de cih nagire lê belê konê xwe divede. Ev halê koçeritiyê ye. Tewettun kon-vedan e ne cih girtine. Koçer konê xwe divedin û paşê dîsa koç dikin. Tewettun jî ji xwe ev e. “Konvedan û koçkirin”.

Wekî din, derkandina “hem ew/hem ev”ê, ku li hember “ne ew/ne ev”a Cizîrî ye, Xanî dîsa dike hilweşangerê Cizîrî. Cizîrî her tişt di nava yekitiyekê bala de helandî bû. Şûna yekîtiyek bala û nasnameyek giştî, Xanî pirrengî, cudahî û ferqê diparêze. Ji bo wî her tişt bi rengê xwe heye û hebûna mutleq di van tiştê de di halê tewettunê de dikeve nav rengê wan. **“Fîlcumle çî ewwel û çî axir, elqîsse çî mu’min û çî kafir/ Her yek ji te ra bûne mezher, ew renga di wan tu bûyî muzmer”.**

Nexwe em êdî dikarin bêjin Xanî Cizîrî “hilweşandiyê”, “bêcih û bêwar kiriye” û “ji nû ve afirandiyê”. Ev afirandina “nû” bi felsefeya Xanî ya giştî ve girêdayî

ye û Cizîrîyê nû jî êdî ne Cizîrîyê berê ye. “Tekrar” e lê ne “eynî” ye û di xwe de ferqê dihewîne. **“Bîna ve ruha Melê Cezîrî-Pê hey bikira ‘Eliyê Herîrî/Keyfek we bida Feqîhê Teyran-Hetta bi ebed bimayî heyran”**. Di vê beytê de di îfadeya “bîna ve” de, “ve” tekrar û dîsaiyê nîşan dide. Cizîrîyê ku dîsa hatî an jî tekrar hatî, êdî Cizîrîyê Xanî ye.

Wek kurte, Xanî weke Seydayekê koçer, ku ne di nav çî temsîl, hiyerarşî û sîstemên runişî de, dixwaze bala me bikişîne li ser buyîn û derbasdariyê, rasteqîn û bûyerê, hizr û helbestê, jîyan û jiyînê. Ne li ser hebûn û teqezbûnê, an jî xeyal û mîtolojiyê, an jî ilm û felsefeyê, an jî zanist û mentiqê. Lewma piştî ew Cizîrî “nuvejen” dike, berê me dide keyfa Feqiyê Teyran. Ew dayina keyfê jî gaziyek e ji bo me. Eger em guhê xwe bidin rasteqîna jîyanê emê wê keyfê destbêxin. Lewma pêşiya serê çîroka *Mem û Zînê* (beşa heştan) de, di beşa derheqê “exbar û elqab û asaran” (beşa heftan) de berê me dide keyf û mûsîqî û reqsê. Yani derkandina çîrokê, ne bi ilm û zanyarî lê belê bi koçerîtî, bi çiyayîtî, bi kinarbunê (yanî bi sînorê) ve girêdayî ye. Xanî vê ji bo me eşkere tîne ziman: **“Kurmanc im û kûhî û kenarî/Van çend xeberê di kurdiwarî”**.

Nexwe em jî niha berê xwe bidin vê keyf û surûra çîroka *Mem û Zînê* ka ji bo me çî “behane” veşartîne û emê wan çawa bînin ber çavan.

V.

Çîroka *Mem û Zînê* piştî weskên Mîr, Zîn, Tacdîn û birayên wî li bajarê Cizîrê bi lîstikekê (newroz) destpê dike. Ev cudahiya berhema *Mem û Zînê* ye ku di wan çîrokên din de (*Memê Alan* û versiyona Hewramî) bûyer, di du bajarên mîtolojîk de diqewime. Muxrib û Yemênşehr. Ev her dû bajar jî, helwestekî hizrî tîne ber çavan ku di berhemên irfanî û tesewwufî de li hember felsefeya rasyonel wek metaforan tîne pêşkêşkirin. Bo nimûne di felsefeya Îbnul-Erebî û Suhrewerdî de ji bo teyrê mîtolojîk “enqayê muxrib” tê bikaranîn. Wekî din di felsefeya gnostika Îslamî de jî felsefeya irfanî li hember “Felsefeya Yewnanî” wek “Felsefeya Yemanî” tê îfade kirin. Lê *Mem û Zîn* rasterast bi bajarekî rasteqîn destpê dike: Cizîr. Wekî din çîrok ne bi kevok û periyan lê belê bi îd û sersalekê, şahiyekê destpê dike. Ji vê jî girîngtir belkî (wek balkişandina Xanî bû ku berî çîrokê behsa keyf û mûsîqî ‘u reqsê kirî-bû), destpêkirina çîrokê bi “lîstikek di nav lîstikê” ye. *Mem û Tacdîn* wek *Zîn û Sitî* bi maskeyan (rûpoş) derdikevin qada newrozê. Ev xalekî girîng e. Bi maske, yanî çî? Yanî “bênasname”, “bêkesayetî” û “bêcinsiyet”. Lê Xanî weskên wan berê ji me ra hêjmartîbû, wek du cinsên dijberî behs kirîbu. Lê niha ev dijberî ji holê radibe. Di çavên me de cinsiyeta wan tune ye lê di çavên *Mem û Tacdîn* (ku di bin maskeya keçîtiyê de ne) de, *Zîn û Sitî* kur in. Di çavên *Zîn û Sitîyê* (ku di bin maskeya kurîtiyê de ne) de, *Mem û Tacdîn* keç in. Ev çûn û hatina wek hejikê di lîstika Xanî de êdî ji me ra vê carê hejika di navbera “ne ew/ne jî ev” û “hem ew/hem jî ev”ê de tîne ber çavan. Ev epîzota maskeyê û hejika cinsiyet û bêcinsiyetbûnê wek *khora*

ya Platon e. Dema mesele dibe khora, wê demê cureyek sêyemîn derdikeve holê. Lewra ji aliyê ontolojiyê ve çawa ku li hemberî dijatiya hebûn û neyînê, mequlat û mehsusatê; bûyîn, wek cureyek sêyemîn derbikeve holê. Heman şiklê di navbera cinsiyetên dijberî yanî keç û kur de, cureyek sêyemîn yanî ne keç/ne kur, hem keç/hem kur jî derdikeve holê. Ev jî tê wê wateyê ku di nezera Xanî de nasnameyên temsîlî wek cinsiyet, bajarîbûn, gihîştîbûn û mêrîtî ne derbasdar in. Ev maske van nasnameyan diveşire û bala me dibe li ser cureyên sêyemîn.

Wekî din, *khora* bi dêşîrê (dayika şîr) ve girêdayiye. Dêşîr ne dayîk e û dijîtiya nêr û mê de cihêkê wê nîne. Belkî bi navlêkirinên Xanî *bikr* e, *dûşîz* e ye, *efîf* e. Xanî jî çîrokê bi *dayeyê* dide dewamkirin. Daye bi dîtina min ji aliyê felsefeya Xanî ve, ji herî girîngtîrînê lehengan e. Daye bi nivîsê ve jî girêdayî ye ku stratejiya Xanî ya felsefî jî li ser nivîsê hatiye avakirin. Nivîs wek jinê an jî dayeyê “jiyan” e, lê gotin wek bavî “mirin” e. Lewra bav temsîl e û temsîl jî sînor û dawîtiyê tîne ber çavan. Lê jin an jî Daye heyat e û pêwîst e nivîs an jî uslûb li ber jinê ve bê rawestin. Lê belê jin/daye jiyanê bi formên zanistî û mentiqî saz nake. Ji xwe weke me got jiyan her tim di herikbariya xwe de bi çî rengî nayê bin sîwaneya zanistî û felsefî û mentiqî. Lewra Xanî jî dayeyê wekî dermankerekî (*pharmakon*) diafirîne. **“Ey daye tu qasidê hebîb î/Bêşubhe li derdê min tebîb î”**. Xanî, wê wekî Arîstoteles û Platon dide nîşan. Daye bi têkiliya xwe ya menewî û bi çêkirina remz û tilismên xwe, hewl dide ku Mem û Zîn, Tacdîn û Sîfîyê derman bike. Remz û tilism jî nîşan dide ku şîfakeriya Dayeyê ne bi ilm û zanistê ye û ne jî bi hişmendiyê ye. Bileks dermandariya Dayeyê bi “derîhiş” tê pêşkeşkirin. Ji xwe *pharmakona* Platon jî hem derman hem jî jehr e. Daye jî di hewldana xwe de ne pijîşkekî rasteqîn e lê bi tilism û falan dixwaze dermana çêke. Bi vi awayî daye bi bijîşkiya xwe ya qelq weke *pharmakon* dibe pîrwateyî. Ev pîrwateyî bi lîstikê ve girêdayî ye û “bêbiryardarî”yê îfade dike. Xanî dîsa me tîne li ser dijberiya dijberitiyê. Mesela Dayeyê, meseleya jiyan û mirinê ye. Ev her dû bi hev re rasteqîn in. Lewra mîrê Misrê Theuth hem mucîdê nivîsê ye hem jî mucîdê lîstik (tewla/nerd, dame û zar) û hejmarê ye jî. Hejmar bi jiyanê ve girêdayî ye û heman weqî de bi mirinê ve jî. Ev nediyarî û xumamî, derfeta lîstikê dide mirov. Lewra *Mem û Zîn* bi epîzotên xwe yên sereke li ser lîstikan hatiye avakirin. Newroz, nêçîr, setrenc...

Elqîsse, seydayê koçer, jiyanê wek bi “avêtina zarê” dinirxîne. Jiyanê ne bi mentiq û zanyariyê, ne bi zarûret û hişmendiyê lê belê bi lîstik û koçeriyê, bi şans û zar-avêtin û derîhişiyê dike epîzodên berhema xwe.

VI.

Mem û Zîn bi temamî di nav hejîkê de dihejê. Ew, poetîkaya hebûn, hizr û helbestê ye. Hinek hişmendî ye hinek derîhişî, hinek bîranîn hinek jibîrkirin, hinek bav hinek da, hinek Mela hinek Xanî ye. Lê poetîkaya çîrokê di dawîyê de li ser “derve mayîna ji temsîlê” hatiye sazkirin. Mem dema baxçeyê Mîr de digel Zînê

işqbazî dike, wate ew e ku *jibîr* dike. Ji ber ku zeman niha ye ne paşeroj ne jî pêşeroj e. Jibîrkirina Mem, xelasbuna wî ya ji paşeroj û pêşerojê ye. Ev sînör-zeman e. Wek din reva ji “mekanê birêxistinê”ye jî. Emê di epîzoda setrencê de behsa mekanî jî bikin.

Wekî din mayîna di nav xewn û xeyalan de, derîhiş û fanteziyan de dijberiyek din derdikeve pêşiya mirov. Dijberiya alema temsîlê. Alema eql û zanyariyê. Alema ideayan an jî alema eynîti, wekhevî, dijîti û analojiyê. Mem di baxçeyê Mîr de dirîyê bostanî ye. Li dijî eql û hişmendiyê ye û mecnun û dîwane ye. Wek simulakrên li hember ideayan e. Tevgera Mem, ji wekhevî, bendkirî, eynîti û yeksaniyê rev e. Ev koçerîti ye. Çimkû, koçer e ew kesê ku ji her cureyên qodkirina hizrî direve. Hizr dema dikeve ser sinorê bêhizriyê wê demê hereket dike. Ev sînör li ser redda temsîlê û bê zimanî, nenasî, hindikahî û azadiyê tê tecrube kirin. Wekî din çawa Deleuze jî tîne ziman ev sînörê koçerî afirandina jiyaneke nû ye. Jiyaneka li ser axê/coxrafya û dinyayê, bûyîn û derîhişiyê tê avakirin. Mem an jî seydayê koçer vê gelek baş dizane ku bingeha buyînê li ser rejîmên dijberî nayê avakirin. Encax li ser afirandin, şans û derîhişiyê tê saz kirin. Lewra gramera zimên di nav gengeşî û dijîtiya aqilmend û dîwane, normal û anormalê de hatiye saz kirin. Ji ber vê pêdiviya revê ji vê temsîlê heye. Bala hizirvanê koçer pêwîst e pitir li ser “û”ya etfê be, ne li ser “e” ya lêkerî be. Ev “û” derfeta bê sînorbûn, pirrengî, bûyîn û texîrkirina wateyê, reva ji qeziyeyên darazî dide.

Koçer li hember temsîlê di nav tevgera afirandina xêzên revê de dimeşe. Li hember gramatika zimên, celebên vegotinên nû û pêkanînên îfadeyên nû diafirîne. Ev qîra an jî banga Ehmedê Xanî ye jî. Seyda di dîwarê vê bedena alema temsîlê de ji ber ku wê bişkêne qulan vedike. Bi vî awayî, bi tîketina di sîstema majoratif, dixwaze lîstika desthilatdariya Mîr wêran bike. A niha li vir, em li ser textikê setrencê, Mîr û Mem temaşe dikin. Temsîl û bûyîn, desthilatdar û koçer.

VII.

Deleuze dibêje rêxistina mekanekê wext distîne. Ew behsa du cureyên mekanê dike ku yek ji wan “mekana bixêz” an jî girûz ya din jî “mekana bêxêz” an jî hilû ye. Pêwendiyên li ser standardên dayîni û rûniştî, di mekanên bixêz de derbasdar in. Mekana bixêz de kesên dêmanî dijîn û ji wan re formên wekî “sîte”, “mîrektî”, “dewlet” û “împaratorî” hene. Sîstemek heye, temsîlek heye û nunêrên vê temsîlê jî xwedî serwet û îqtidar in. Mekana bêxêz, pirrengiya hêmanên beramberî hev îfade dike. Ev mekan tê de çî temsil û hiyerarşî ne derbasdar in û mekanekî koçerî ye. Bo nimûne çol û deşt û behr, mekanên bêxêz in.

Textika setrenca Mîr mekanekî bixêz e. Setrenc bi 8x8 malikên xwe hatiye qodkirin, usûl û qaideyên vê lîstikê temsîla desthilatdariya Mîr de watedar e. Yek şehînsah heye û ew jî wekî “Wacibul-Wucûd”ê lîstikê ye. Ew nebe lîstik jî tune ye. Her tişt li dorî şahî vedigerê. Mem jî li ser textikê sekiniye û di nav lîstikê de cihê

xwe girtiye. Ji ber ku koçer e û pêwistiya wî qolkirina bedena sîstema Mîr heye. Ji bo qolkirinê nasîna sîstemê bi başî lazim e. Mem jî **“bi bend û baz e”** û zora Mîr dibe.

Mekana bixêz mekanekî girtî û xwedî distûr e, ji encaman pêk tê. Lê li hemberî vê, mekana bêxêz bi nermîtî û guherbariya xwe watedar e û ji pêvajoyan pêk tê. Dêmaniyên vî mekanî yanî koçer, her daîm dixwazin li ser bêcih û bêwaritîyê bicih û biwar bibin. Hewildana Memê jî xuyaye ku ev e.

Lê em dizanin mekanên koçeran mekanên wekî çolê hilû ne. Li wir de çî rê û çî şop û dewş jî tune ye. Tu dikarî herî her deverê. Mekanekî bê dawî ye. Li çolê de çî emareyên berê jî nînin ku hetta tu bimînî di bin bandora wan de. Hetta bi xwe sînor jî tune ye. Bê şekl e lê şiklî dide. Wek *khora*yê ye. Cihê koçeran e ji “dîtin”ê pitir “sehkirin” e çol. *Mem û Zîn* jî wekî çîrokekê ji dîtinê pitir bi bihîstinê bi got û bêjê tê pêşkeşkirin. Dengê dengbêjan ji dengê aqilmend û zanyaran çêtir tê sehkirin. Di vê derê de hem jibîrkin hem jî bîranîn heye. Lewra çol yanî mekanê Mem an jî mekanê Seydayê koçer, banga hizirkirin û helbestçêkirinê ye û derfetên bêsînor û bêdawîyê diafirîne. Wekî Derrida dibêje çol ne kirde ye ne jî heyber e. Ne di nava çî obje û subjeyê de ye, lê belê di nava mirov bixwe de ye.

Ziman, dîrok û sosyolojî tev di bin paradigmayên mekanên bixêz de tînin qodkirin û şifrekirin. Lê belê tenê evîn li ser mekanekî hilû û şemîtok e û coğrafyayekî wek çol û deryayê dixwaze. Newxe koçer û mecnûn heman kes in û di mekanên hilû de diçin û tînin. Mem jî wekî go mecnûn e **“bû dînekî dilpezîr û sewda-mecnûnekî bênezîr û şeyda”**, dema berê wî dikeve li bal Zîn êdî setrenc û sîstema Mîr hildiweşe. Lê ev tertîb û plan bi xêra Beko çêdibe. Niha em dikarin bipirsin ku gelo Beko kiyê an jî çiyê baş e an jî xirab e?

VIII.

Di *Mem û Zînê* de Beko bi dîtina min karakterê herî girîng û afirînerê çîrokê yê sereke ye. Hem Mîrî baş dizane hem jî Memî. Hem desthilatdariyê baş dizane hem jî koçeritiya ku bedena mîrekiyê qol dike dibîne. Ji ber ku li ser textikê setrencê di navberê de sekiniye û hem mekana bixêz dibîne hem jî mekana bêxêz. Niha berê Memê dide dilbera wî. Dizane ku ya vê sîstemê hilweşîne evîn e. Lewra dixwaze Mem *îtîraf* bike. Îtiraf jî bi çolê ve girêdayî ye yanî berderketina ji mekanaan ve watedar e. Mem pêwîst e ji vî mekanî derbikeve. Ev jî encax bi îtirafê mumkin e. Derrîda îtirafê ne bi zanînekê ve ne jî bi danasînek, fêrkirinek, eşkerakirinek an jî bi lêkerbûn û hikmî ve gire dide, bes îtiraf çavdêriyek û govaniyek e. Şahidiyek gelemperî ye. Ev jî bi nivîsê ve girêdayîye. Nivîs ne ew tiştê ku di defter û kitêban de mevcûd e lê belê jiyan bi xwe ye. Lewra Derrida dibêje “ji bilî metnê tiştê tune ye”. Çavdêriya gelemperî êdî dibe bûyîn, dibe nivîs û dibe puxtîya jiyanê bixwe. Beko dema Mem mecburî îtirafê dike ya rastî wî bi evîn û koçeritiya wî ve girê dide û cihê wî yê resen jî nîşanî wî dide. Çimkî ev îtirafkirin cihê bê cih e û redkirina cih

û warî ye. ev jî, ji xwe *khora* bixwe ye.

Beko her çiqas, ji ber ku sedemê evîna Mem û Zînê ye, bi şefaeta Zînê li vê dinê tê paqijkirin jî, **“mehrûm mekin Bekir emanet”**, lê bele di dawiya *Mem û Zînê* de di axretê de jî tê xelaskirin û wek kesekî “aqibetxêr” di cînetê de dibe xwedî paye. Ji ber ku Beko bi gotina Xanî “qapûçî” ye yanî dergevan e û ev jî dibe sedema xelasbuna wî. **“Go: “Şeyxo tu ma nizanî kî me! Ez ew Bekirê ku qapûçî me”**. Dergevanî her çiqas di çîrokê de bi çavdêriya mala Mîr ve girêdayî be jî, di poetîka helbesta Xanî de wek têgehê girîng xuya dike. Di vê çarçoveyê de dergevanî bi guhdarî û cîraniya derketina heqîqetê ve watedar e. Ji ber ku, çawa Heidegger jî tîne ziman, însan di derkandina heqîqetê de pêwîst e dergevanîya an jî şivanî û gavaniya hebûnê bike. Însan ne mamosteyê habûnê ye lê belê dergevanê wê ye. Di encama vê çavdariyê de, bexşandina hebûnê û pêkhatina qedere mumkin dibe. Bi vê wateyê Xanî, li Beko xwedî derdikeve û çawa ku temsîl û aparatên temsîlê (wekî nijad, cinsiyet, dîn, çand, netew) di koçeritiya Memê de ji nû ve tîne derkandin û nirxandin, xerabî jî bi kesayetiya têgehî ya Beko ji nû ve tê pêşkeşkirin.

Beko di navberiya hemû karakter û lehengên çîrokê de ji her aliyan ve dikare mudaxeleya çîrokê bike. Lê ew bi xwe bi qodkirina xwe razî ye û rola xwe ya çavdêriyê di epîzotên berhemê de bê kêmasî tîne cih. Ev jî berê me dide vê nuqteyê: ji bo derketina evîne îtiraf lazim e û ji bo tekanetiyê jî eynîti û êrîşa li ser ferq û cudahiye lazim e. Lewra Beko vê rolê dilehîze û eger ew nebe çîrok jî wê bi temamî hilweşe. Newxe em berê xwe bidin eynîkirina Beko û tekanekirina Mem.

IX.

Piştî epîzoda setrencê diyaloga Mem û Beko li ser îtirafkirinê berdewam dike. Hewildanên Beko tev ji bo îtirafkirina Mem bi Zînê ye. Hetta niha çî dek û dolap, xap û tevdîrên wî encam nedabû. Lê dema li ser textikê setrenca Mîr berê wî da Zînê û bîra koçeriya wî anî bîrê û ji ber vê jî di lîstikê de wî da windakirin êdi bingeha îtirafa Mem jî hazir dibe. Vê carê Beko dilbera Memê bi eynîtiyê tîne rojevê û dibêje ew wekî kesekê ji rêzê ye. **“Go min diye ya Memê hebandî, gêjek ‘Ereban e lêvdeqandî/Ser ta bi qedem reş e wekî qîr, ne layiqê behs û xwestina Mîr”**. Ev eynîkirin e û wirdebirin û negatîfkirina ferq û cudahiye ye. Ev teşebbusa eynîtiyê, bi serhildardariya Mîr a majoratif û homojen ve girêdayî ye. Lewra ev sistema temsîlê ji bo spehitayiyê eynîtiyek, wekhevîyek, îdea û puxtuyek dihesibîne. Li gorî vê eynîtiyê, her pirrengî ya ku di hebûnê de heyî ji wan re puxtuyek û mahiyetek heye. Dîsa di vê têgihştinê de cudahî û ferq jî dijber û dijberwateyên eynîtiyê ne. Piştî ku Mem ev xeber seh kir temamî ji eqlî bê xeber ma û dest bi îtirafa xwe kir. **“Te’nê di Memê wusa eser kir-Yekcar ji ‘eqlî bê xeber kir”**. Nexwe ji bo îtirafê pêwîstiya derîhişê lazim e û dema Mem ji saheya hişmendiyê derdikeve wê demê êdî ferq û cudahiya dilberê dibîne û îznê nade eynîkirina Beko. Mem di qada derîhişê de têgihîştina Mîr û Beko ya majoratif û homojen, bala û eynî, îdeal û

puxte dihilweşîne û wan bê cih û bê war dike. Lewra Mem di vê derê de êdî rasteqînek mînoratîf û heterojen, cuda û ciyawez, nizm û pirreng dibîne. **“Go: qet ne we ye, wekî wî gotî, Mîrê’m perî yê dilê’m sohtî/Şehzade ye, şehneşîn-mekan e ‘enqa ye, bilind e aşîyan e - Mîranî ye ew, ji neslê pak e, nûranî ye ew, ne ab û xak e/Serdefterê hor û nazenîn e herçend melek e, bi navê Zîne”**. Di van beytan de her çiqas bêhna balakirinê bê jî bi dîtina min helwesta Mem, pûçkirina eynîtiya Beko ye û tekanebûna Zîn û buyînê ye. Ji bo spehitayiya Zînê ew tiştên ku bêhna puxteyên ji wan tê ji bo her dildar û dîlberê jî derbasdar e. Her buyîn bi serê xwe ji yek din cuda ye û rasteqînekê dihewîne. Ev berevajîkirina Mem e ku ji hebûnê li bal buyînê, ji eynîtiyê li bal cudahiyê, ji yekitiyê li bal pirrengiyê ve diçe. Ev berevajîkirin û dubare vebatîn bîra vebatîna ebedî ya Nietzsche tîne bîra mirov. Di vebatînê de êdî puxte tune ye, buyîn heye. Rasteqîn û ferq û pirrengî heye.

Tekanekirina Mem bi derîhişiyê ve girêdayîye. Ev derîhişî afirînerê vê pirrengiyê ye. Delezue ji vê re dibêje şîzo-analîz. Ev jî bi “vîrtuel”a Bergson ve girêdayî ye. Vîrtuel û aktuel, bi hev re kar dikin. Vîrtuel bi cudahî û ferqa xwe ya çawanî, aktuel jî bi cudahî û ferqa xwe ya çendanî derbasdar e. Derîhiş, îmkân û derfeta tekanekirinê dide Mem, Mem jî bi rasteqîniya xwe ya tecrubî û aktuel bi vê derfetê re têkildar e. Ev pêvajoyê, ne yekalî ye lê belê her dû li ser hev xwedî bandor in. Derîhiş bi awayekî erênî divegerê. Ji bo vê veğerandin û tegerandî çî yasa û şertên mentiqî û zanistî jî tune ne. Bi temamî bi “zar avêtinê”, bi mucîzeyan, bi şans û tesadufan ve girêdayîye. Bi şiklê lîstik û şanoyê derdikeve holê. Ev tegerandî wek Deleuze jî tîne ziman tekanetî, îstisna, enstantane û ebediyetê di xwe de dihewîne. Tekanekirina Mem jî di şanoya Xanî de pewîst e ji vî alî ve bê nîrxandin.

X.

Kurdolojî, xwedî çarçoveyekî ilmî û akademîk wekî her qadên zanistê tê peşkirandin. Kurd û lojîk/mentiq/zanist tîne cem hev û bi hev re sîstemekê û temsîlekê diafirînin. Ji bo me usûl û qaîdeyên ziman (rastnivîs, morfoloji, sentaks, wate hwd.), edebiyat, dîrok, hizr û sosyolojiyê pênasê dike, di nav taksonomiyên xwe de rêzê dike, dabeşê dike û analîzê dike. Li ser qaîdeyan û zagonan bi klîşeya “camî’ê efradê xwe û manî’ê exyarê xwe” hem xwe sînordar dike hem jî exyarê xwe dide aliyekê. Ji aliyekî din dadgehekê saz dike û di vê dadgehê de dozger û dadger jî tîne afirandin û li hember gumanbar/gilîdar disekin. Sûcê gumanbar diyar e: Li hember qanûnê derketiyê û hewildana wêrankirina sîstemê kiriye. Lojîk, makezagona dadger û dozgerî ye li gorî vê makezagonê dozê tê dadkirin. Encam jî diyar e: qewirandin, nefkirin an jî aforozkirin. Yek ji gilîdarên vê dadgehê jî Xanî ye.

Xanî bi koçerî û kinarîya xwe (**Kurmanc im û kûhî û kenarî**), di halê lîstikvanî û revokiyê de (**Kurdî, ‘Erebî, Derî û Tazî/Terkîb kirin bi hezî û bazî**) her tim ji sîstemên runişîfî û major, ji çînen çikayî û hiyerarşîk derdikeve. Ev merhela ewil e ku di vê derê de hêj çêkirinên têgeh û kesayetan ne hazir in. Bes derî-aqil û hiş-

mendî derbasdar e û em vê, bo nimûne, di tevgera Dayeyê de dibînin. An jî di halê Memê ku di baxçeyê Mîr de dibînin. Xanî bi kinarîbûna xwe ji halê hişmendiyê li bal derîhişê di hejikê de dihejê û dihejîne jî. Ne di qadê de, ne di malê de, ne di Kurdolojiyê û hewşa wê de lê li ber deriyê wê. Çavdêr û qapuçiyê Kurdolojiyê. Xanî di kinarê Kurdolojiyê de ye. Lê belê şarezatiya Xanî pitir li ser îcadkirina kesayetên têgehî derdikeve holê. Mîr, Daye, Beko hwd. Çêkirina kesayetan ne razberkirin an jî metafor û remz in. Ew zindî ne û Seydayê Xanî her tim bi devê wan kesan diaxife. Ev kesayetên têgehî, wek Deleuze jî tîne ziman cih û warê hizrî bêcih û bêwar dikin û dîsa bicih û biwar dikin. Qonaxa sêyem de Xanî êdî têgehên xwe yên sereke diafirîne. Kurdiwarî, kinarî, tewettun, reqs û keyf hwd. Dîsa, behaneyê afirandina “seyda” û “koçer”ê jî.

Dawiya dawî ew berê me dide zewq û keyf û reqsê, govend û şahiyê. Ev reqsa hizr û helbestê ye û her daîm guherbariyê û azadiyê dixwaze. Di vê keyfê de cuda-hiya hizr û tiştê ji holê radiibe. Êdî tengavbûn û bêhtengbûnê cihê xwe dide afirandin û keyf û şahiyê. Newxe ev têgihîştin ne rasthatina kurd û lojîk an jî zanistê ye, lê bele rasthatina kurd û jiyane ye. Wek kurte bêjim; Kurd(î) ne lojîk e lê heyat e. Heyat.